

'Çareseriya pirsgirêka Kurd êdî careke din nehelin bihareke din'



27/5/2009

AMED, bakûrê Kurdistanê (HAWAR NET) -- Hevserokê DTP Ahmet Turk, di axaftina xwe ya koma meclisê de destnîşan kir, nabe ku çareseriya pirsgirêka were paşguhkirin û ji bihareke din re were hiştin.

Turk got, "Aliyekî çek bêdeng kirine û ev pirs kir; başe wateya van operasyonan çi ye? Eger bêçalakbûneke dualî pêk were, wê pêvajoya aştî û demokratîk jî karibe despê bike."

Ahmet Turk, ji bo gotinên: "di nava dewletê de lihevkerin heye" jî got;"eger lihevkerina tê behskirin heye, divê pêvajoya bêçalakiyê ya fiilî jî dest pê bike."

Hevserokê DTP Ahmet Turk, îro li civîna koma partiya xwe ya Meclisê de got, ku pêvajo pir dijwarî dimeşe û pir nazik e. Ahmet Turk, got Tirkiye, di navbera guherîna demokratîk û tarîtiya Serdema Navîn de ye. Turk destnîşan kir ku di vê rewşê de Tirkiye di navbera çareserkerina pirsgirêkên xwe û israra di şer de diçe û tê. Ahmet Turk got, ew grîngiyê didin daxûyanî û guftugoyên dawî yên Serokkomar, medya û rewşenbîran û xwest ku çareserî neyê piştguhkirin û ji bo Bihareke din neyê hiştin.

Hevserokê DTP Ahmet Turk, herwiha bal kişand ser zêdebûna operasyonên bi armanca tunekirinê û got: ji ber şer û operasyonên ku dijwar dibin em bi fikar in. Turk, navberdayina operasyonan ya beriya hîlbijartinan bi bîr xist û wiha got, "Wer xûya ye eger bê xwestin dikarin navberê bidin operasyonan û qiyamet jî ranabe. Başe, çima niha operasyon ranawestin?"

Ahmet Turk, agirbesta ku Tevgera Azadiya Kurd beriya du salan îlankirîbû bi bîr xist û got, "Serokwezîrê Tirkiyê erdogan digot eger çek bêdeng bin, ji ber xwe ve operasyon nayên kirin" lê niha çima wan gotinên xwe nayne bîra xwe?"

Aliyê din çekan bêdeng kiriye başe wateya van operasyonan çiye?

Hevserokê DTPê Ahmet Turk wiha devam kir, "Ez dixwazim ji rêzdar serokwezîr bipirsim; Aliyê din çekan bêdeng kiriye. Em niha meraq dikin, başe wateya van operasyonan çiye?"

Ahmet Turk got, eger pêvajoya şer û pevçûnan dîsa despê bike, wê hêzên dij-demokratîk bikevin dewrê û ev hişyarî kir: eger wiha be wê pêvajoyeke xeter despê bike.

Eger lihevkerina ku tê îddiakirin hebe divê derbasî pêvajoya bê-şer a fiilî bibin

Ahmet Turk, gotinên serokkomar yên weke, "di nava saziyan de lihevkerinek heye" bi bîr xistin û got: Eger lihevkerineke wisa hebe, ji bo vê yekê pêwiste pêvajoya bê-şer despê bike.

Turk got, di vê çarçoveyê de berpirsiyarî dikeve ser milên Erdogan û hukümetê û xwest, ku li şûna polîtîkayên "Bimre û bikuje" polîtîkayên "Bijî û bijîne" despê bike.

Divê tilî ji ser tetikan bê kişandin

Turk destnîşan kir, ku divê beriya her tiştî kuştin û mirina mirovan raweste û got, "eger rewşa bêçalakiyê bibe du-alî wê despêkirina pêvajoya aştî û demokratîkbûnê hêsantir bibe."

Heveserokê DTPê, nêzîkbûna 1 Hezîranê jî bi bîr xist û bang li hukûmetê kir, ku ji bo çareseriyê rast û durust tevbigere û derhal însiyatîfê bigre destên xwe û vîna çareseriyê nîşan bide. Turk, bang li Erdogan kir, ku were ser xeta xwe ya sala 2005an û helwestên ku tevgera kurd bi terorîstiyê sûcbar dikin rexne kirin. Turk wiha got: "Pîlanên ji bo tesfîyekirina muxataban tên kirin, zext û her cûre çewisandin zihniyet û polîtîkayên ergenekonê ne."

Turk wiha axivî: "Divê hukûmet nîşan bide ku ew ji vê zihniyetê dûr ketiye û cûda difikire. Di 2005an de de Erdogan li hemberî hin hêzên paş ve gav avêt û divê ji wê rewşê dersekî derîne û teslîmê pêvajoya Ergenekonê nebe.

Divê herkes destê xwe bixe bin kevîr

Ahmet Turk, di axaftina xwe koma Meclîsê de wekî din got, ji bo pêvajoya çareseriyê wezîfe dikeve ser milên hukûmet, muxalefet, rewşenbîr, rêxistinên civaka sîvîl û medyayê û ji van derdoran xwest, ku daxwaz û fikarên xwe yê siyasî bidin aliyekê û herkes destê xwe bixe binê kevîr."

Turk wiha dewam kri: Eger bi hiş û aqilê hevpar diyalog pêş bikeve, wê welat ji destên statukoperestên rizgar bibe.

Hevserokê DTPê Ahmet Turk, behsa mîfîngên Wan û Stenbolê jî kir û xwest peyamên gel baş bîn fêmkirin û pêwîstiyên wan bi cih werin. Hevserokê DTP'ê weha axivî, "Berdêla wê çî dibe bila bibe, em ê ji ya xwe neyên xwarê. Eger me bavêjin girtîgehên û her cûreyê zextan li me bikin jî, heta em daxwaz û hêviyên gelê xwe bi cih bînin, em ê vê têkoşîna xwe ya bi rûmet dewam bikin."

Turk anî ziman ku operasyon li dijî partiya wan, niha bi girtina îfadeyan a bi darê zorê ya parlamenterên wan dewam dike. Ehmet Turk da zanîn ku ew ê neyên lîstokan û got, ya li ser wan tê ferzkirin ne di çarçoveya huquqê de ye, lê belê biryareke siyasî ye...

Ahmet Turk: Em ne berpirsyarê krîzê ne

Hevserokê DTP'ê bi bîr xist ku tevî mafê wan yê destnedanê jî, par hat xwestin werin dadgehkirin û got, wan der barê mijarê de Serokê Meclîsê hişyar kiriye, lê ji ber ku tedbîrên pêwîst nehatin girtin, rewş îro veguherî krîzê. Turk weha axivî, "Em ne berpirsyarê krîzê ne, ji ber vê yekê em ê nebin hevkarê bê huquqiya heyî." (*çavkaniya giştî: Dîha*)